

## Înkarkirin û aşartin

Ez hemî mafên ku ji ber radestbûna şaş ê Mihemedî fêr kiriye, înkâr dikim.

Ez texmînkirina derewîn a ku Mihemed pêxemeberekî ji cem xwedê ye, înkâr dikim.

Ez baweriya ku Quran gotina xwedê ye, înkâr dikim.

Ez her mafekî ku ji şahidtiyê derketiye, di her carê ku min bi lêv kiriye de, înkâr dikim.

Ez her mafekî ku ji ber xwendina min a sûreya ElFatîhe derketiye, înkâr dikim. Ez baweriya ku li cihûyan hatiye xezebê û mesîhiyan riya xwe şaş kirine, înkâr dikim.

Ez heznekirina ji cihûyan înkâr dikim, û radigihînim ku ew nerast e

Ez hemî mafên ku ji ber xwendina Quranê derketine înkâr dikim û ez desthilatiya wî ya li ser jiyana xwe, red dikim.

Ez hemî mafên ku ji ber îbadetkîrinên şaş ên li ser bingeha sinneta Mihemedî, înkâr dikim.

Ez hemî mafên ku ji ber şîretên derewîn ên ku Mihemedî di derbarê xwedê de dane fêrkirin înkâr dikim, herwiha gotina ku "Allah" wek çawa Quran ew fêr kiriye, ew heman "Allah" e yê ku di pirtûka pîroz de.

Ez xwe ji wiswasên herdu şahidtiyan di guhê xwe de, di gava jidayîkbûna min û bapîrên min de, bêguneh dikim.

Bi taybetî ez nimûneya mezin Mihemedî red dikim. Xwe ji tundiyê bêguneh dikim, ji gefxwarinê, ji heznekirinê, ji tadekirinê, ji xapandinê, ji tadekirinên cinsî û jinan, ji dizînê û ji hemî gunehên ku Mihemedî kirine, bêguneh dikim.

Ez şermiyê red û înkâr dikim. Radigihînim ku roja hesabê di Îsayê Mesîhî de tine ye, û xwîna Mesîhî min ji her şermiyekê paqij dike.

Ez tîrsa ku bi riya Îslamê hatiye belavbûn înkâr dikim. Ez bexişîna xwedê dixwazim ji ber ku ez ketim bin hukma gefên Îslamê, û dixwazim bi xwedê, bavê xwedayê me Îsayê Mesîhî di hemî mijarên xwe de bawer bikim.

Ez bexişîna xwedê ji bo her kiryareke nepîroz ku min ji ber peyrewbûna Mihemedî kiriye, dixwazim.

Ez bawerkirina nerast a ku Îss dê vegere daku şerî'eta Mihemedê li hemî cîhanê ferz bike, red û înkâr dikim.

Ez dixwazim peyrewiya Mesîhî bikim, nekes ji bilî wî.

Ez diaşêrim ku Îsa kurê xwedê ye, û ku ew ji ber gunehên min li ser çarmixê mir, û ji bo xelasa min ji nav miriyan rabû. Ez spasiya xwedê ji bo çarmixa Mesîhî spas dikim, û dixwazim çarmixa xwe hilgirim û li pey wî herim.

Ez diaşêrim ku Mesîh xwedayê hemîyan e. Xwedî desthilatî li erdê û asîmanê ye. Ew xwedayek e li ser jiyana min. Herwiha diaşêrim ku ew ê dîsa were daku miriyan û zindiyan şermezar bike. Ez xwe bi Mesîhî ve girê didim û radigihînim ku xelasa min bi kesekî din ji bilî wî tine ye.

Ez bavê xwe yê asîmanî vedixwînim daku dilekî nû bide min, dilê Mesîhî, daku rêkê li pêşiya min di hemî gotin kiryarên min de, bike.

Ez hemî îbadetkirinên şaş red dikim, û bedena xwe ji bo îbadetkirina xwedayê zindî, bav û kur û giyana pîroz, dispêrim.